

# ALSO

Arbeitslosenselbsthilfe Oldenburg e.V.  
Beratung in den Landkreisen Vechta und Oldenburg  
Vechta: 0157-83420682  
Oldenburg: 0176-43302127  
www.also-beratung.de  
lk-beratung@also-zentrum.de



**Mijar:** Alîkarîya ji bo Zarokan (01.01.2016)

Bi nasandina hizmeta Sosyal ya ji bo Mirovên bikaribin bixebitin, Arbeitslosengeld II (ALG II), bi alîkarîya Bêkarîyê û bi alîkarîya Sosyal bûne yek. „ Ev Zagonên han ne li dijî hejarîyê, be-revajî wê hejarîyê hîn qewî tir dike”, Sazîyên alîkarîyên Sosyal yê wekhevî, wiha di broşûrê xwe de dinivînin: “ ji bo jîyankirinê kêr”. Li tevahiya Welêt her ji penç Zaroka yek di hejarîyê de dijî. Zarokên ku Dê û Bavê wan hatine kê baş hene, li gorî Rapora hikumetê ya hejarî û Dewlemendîyê, ji Zarokên Malbatên hejar 7,4 cara zêdetir şensê wanî ku xwandina bilind bikin heye.

## Pewîstî

Zarokên heta pênc salî, pêwîstiya wan ya mehane wekî 237 Euro hatîye qebûlîkirin. Ji bo Zarokên di navbera 6 û 13 Salî de 270 Euro û ji bo yê ku di navbera 14 û 17 Salî de ne 306 Euro. Asta bilindbûna alîkarîya ji bo Zaroka, li gorî ya Mezina hatîye pîvandî. Ev divê ne li derveyî pêşketinê sîyasî bêne ditîn. Asta pêwîstiya alîkarîya Zarokên di navbera 6 û 13 Salî, ya Sala 2009 vêna dide nîşandan (Berê Zarokên di navbera 0 û 13 Salî de wekî yek Komê dihatin qebûlîkirin!). Ev cûdahî ji ber nerazîbûne, Kesên bêkar û Sazîyên wan, ji aliyê Rêveberîyê wekî Zagon hate qebûlîkirin. Eva piştî rexneyên me yê li ser cûdabûna Zagonên heyî, ji aliyê LSG Hessen û Dadgeha sosyal ya Federal hate berçavîkirin.

Wekîdin tene ji bo pewîstiyên Awarte, alîkarîyên zêde hene (Berê xwe bide Tabela ya jêrê).

## Ducanî

Jinên ducanî ji hefteya 13 min pêde dikarin serî li alîkarîya zêde 17% bidin. Mînak: jina ducanî bi tena

xwe dijî, ji 17% ji 404 Euro, bi heval yan jî bi mêrê xwe re dijî, 17% ji 364 Euro ( Berê xwe bidin Tabela yê).

Ji bo rêkûpêkirina di dema Ducanî yê de, wekî li cem alîkarîya Sosyal ya ji bo carekê dihate dayîn. Li Oldenburg girover bi qasî 77 Euro hatîye qebûlîkirin. Ger Pêwîstiyekî hîn zêdetir bê çespandin, divê rewşên Awarte bîn lêkolînkirin ( bi Nakokî yan jî bi dozdarî) û alîkarîya zêde bê naskirin.

Kesên Ducanî ku ferzîşerunga wan ya Nexweşî yê tunne ye, Mafê wan ji bo hemû hizmetê Pijîşkî, hizmetê Pîrikî, ji bo Derman û pedivî yen din hene. (§ 50 SGB XII) û ji bo berketina Ducanî yê jî. Daxwazname yê xwe bighînin Krankenkasse yan.

Wekîdin i.d.R dikarin heta meha sisê ya ducanî yê, ji bo alîkarî yê “Dê û Zarok” ku ne li ser Alg II bêne hesibandin, serî lê bidin.

Dora heşt heta duwazdeh Hefte berî çêbûna Zarok, dikare ji bo Alîkarîya yekem ya rêkûpêkirine, serî lê bidin. Li Oldenburg girover dora 154 Euro ya tê dayîn. Ev pêwîstî ya Cuda ne di nav pêwîstiyên rêzê de ne. Alîkarîya yekem ya rêkûpêkirinê girêdayî Pêwîstiyê Dê de ye. (BVerwG 18.10.1990, FEVS 41, 309; § 15 Abs. 1 SGB XII; OVG Rheinland-Pfalz 30.03.2000, FEVS 2001,15)

## Zayîn

Zarokên nu çêbûyî xwedî mafin ji bo rêkûpêkirina taybet ya Malê (§ 24 Abs. 3 Nr. 1 des Zweiten Sozialgesetzbuch bzw. SGB II), Mînak ji bo Dergûş, livînê Zaroka, Doşek usw. Ev alîkarî jî girover tê hesibandin, li Oldenburg 158 Euro. ( Biryarekî Dadgeha Sosyal ya Hamburgê dibejî ku pêwîstiya Zarokê nu çêbûyî dibe ku ji hesibandina girover zêdetir be) peşnîyare ji bo bidestxistina mesrafa zêde ya di rastîyê de be tevger kirin!

## Perê Dê û Bav

Jin û Zilam dikarin heta duwazdeh Meha, her serê Zarokêî perê Dê û Bavîfî ye, herî kê m 300 Euro bistînin. Ger Dê yan jî Bav di Sala berî çêbûna Zarok hatinekî wan ya bilind hebe, Perê dê û Bav dibe ku li ser bê hesibandin. Ji bo du Mehên din jî Pere tên dayîn, ger Dê yan jî Bav, du Mehên zêde bi xwedî kirina Zarok ve mijûl bibin.

„Spas“ hukûmeta Federal ji bo Jin û Zilamên bêkar ji 1.1.2011 ve nema Perê Dê û Bav, ya ku li ser ALG II tê hesibandin. Bi vî rengî Zarokên kesên bêkar dibin wek Zarokên Çîn a duyemîn – nêzîkatîya bi van Zaroka tê kirin wekî nêzîkatîya bi Zarokên Dê û Bavên dewlemend, ku Hatina wan ya salane herî kê m 250.000 Euro ye, ku bi xwe perê Dê û Bav nasfînin. Ya din tene ji wan Kesan re derbas dibe ku berîya çêbûna Zarok wekî Aza yan jî bi versicherungspflicht xebitîbin, dikarin 300 Euro pere yê Dê û Bavîfîyê, ku ne li ser Alg II tê hesibandin bistînin.

### *Perê Zaroka*

Ji bo Zarokê yekem û yê duyem 190 Euro, ji bo yê sîyem 196 Euro û ji bo her Zarokê din 221 Euro tê stendin. Ji Zarokê Çarem pê de, Pere di nav Zarokake de wekî hev tê parvekirin. Perê Zaroka li gorî Zagonê heta sala 18. tê dayîn, Ciwanên ku xwe wekî, kesê li Kar digerin, xwe qeydkirine dikarin heta 21 salîya perê Zarokbûnê bistînin. Ev ji bo Xwandekarî û Perwerdeya Meslekî heta 25 Salî ye derbas dibe û ger Perwerde ji ber bêcîhbûnê dest pênekiribe jî.

Perê Zaroka di Çarçewa Alg II Perê Sosyal wekî hatina Zarokê bin 18 Salî tê naskirin (§ 11 SGB II). heta Zarokê kem Temen Versicherunga xwe bi xwe hebe, ya ku li gorî Zagonê yan jî ji navenda Kar wekî Maqul hatiye naskirin, Perê zaroka ji hesabê wî girover wekî 30 Euro te pakijkirin (§ 6 Abs. 1 Nr. 2 Alg-II-Verordnung). Li vir divê hûn berîwê serî li ALSO bidin û xwe di derbarê Mijarê baş agahdar bikin.

Ger Zarok bi Debar, Perê Zaroka û Perê Malê pêwîstîyê xwe bikaribe bigre: Dê û Bav dikarin ji bo Perê Zaroka û yê Malê seri lê bidin. Piştî Navenda Kar dikare beşek ji Perê Zaroka, ku ji Zarok bi xwe re ne pewîst be, ji Dê û Bav bihesibînin. Di rewşê kî wiha de Navenda Kar dikare 30 Euro ji bo Dê û Bav, ku bi hevdû re dijîn, kê m bikin, Malbat bi vî rengî zêdetir Pera bi dest dixin.

Tipp: Karmend dikarin Per'e Zarokên ku li ba Dê û Bavê xwe ne û Temen tîje ne ku ji ber Perwerdeya Meslekî ne xwedî mafê Alg II ne, tene beşekî jê dikarin qut bikin, ger Dê û Bav Perê Zarok di cîh de bişînin ser navê wî. Zarokên ji 18 mestir û nema li cem Dê û Bavê xwe dijîn, dikarin serî li Familienkasse bidin. Karmend dikarin Perê Zarokan

tene li cem Pewîstî ya hevbeş ya ku tê dayîn, bihesibînin. Ger Zarokê 18 salî yan jî mestir hîn li cem Dê û Bavê dijîn, mafê wan ji bo 30 Euro Freibetrag yê ji bo Pflichtverschicherungsbeitrags (zêdetirî xwe li cem KFY) heye.

### *Bexçê Zaroka*

Di navbera yeksalî û destpêka çûna Dibistanê, Mafê Zaroka ji bo cihekî li Krippenplatz yan jî li Bexçê Zaroka heye. Ji bo cihekî li Bexçê Zaroka divê serî li cem Jugendamt bê dayîn. Ji ber ku Kesên li ser Alg-II di sînorê hejarî yê de ne, mafê wan ji bo cihekî nîvrojî ya bê heq heye. Zarok li Tagesstätte xwarina nîvro dixwun, piştî Kesên li ser Alg-II dikarin ( heta Tageseigenanteilbeitrag yek Euro yî) ji Navenda Kar bistînin ( Kesên ku Perê Zaroka distînin yan jî Perê Malê distînin, dikarin serî li Familienkasse bidin). Mesrafa ya seyranê yan jî gerên pirrojî yên komên Bexçê Zaroka jî, ji aliyê Navenda Kar yan jî Familienkasse tê hilgirtin. Hûn dikarin bixebitin, heqê Werbunga jî di nav heqê Bexçê Zaroka de ye (§ 11 Abs. 2 Nr. 5 SGB II). Bidin berhev, be ka heqê Werbung grover zêdeye. Hûn dikarin li cem Finanzamt heqê grover yê bilind nîşan bidin û pêre Hatina xwe zêde bikin.

### *Dibistan*

Xandevanên Dibistanên Perwerdeya giştî (Seretayî-Navend- Amadeyî û yên Meslekî) heta 18. ya xwe endamê civakapêwîstîdarin û heta 14. ya xwe Perê Sosyal, ji 15 Salî ya xwe pêde xwe bi Alg II ya Kesên dikarin bixebitin ve girêdidin. Kesên ku naçin Dibistanên Perwerdeya giştî, divê li gorî li jêrê hatiye nîşandan tevbigerin; ji vir pêde gelekî tevlihev dibe.

SGB II heqê Seyranên yekrojî û Gerên pirrojî li gorî bilindbûna ya rastî dibîne. Ev alîkarî nabe gorver bê hesibandin. Dadgeha Federal ev Biryar qebûl kir (Biryar ji 13.11.2008, Az: B 14 AS 36/07 R) ku ji bo Ciwakên hejar bibe alîkarîyekî biçûk.

### *Û pêwîstî ya Dibistanê... ?*

... li cem Alg II nehatîye berçav kirin û di sala 2005 de jî li ser Alîkarîya yekcarî nehatîye sekinandin. Di navberê de ji bo her Zarokê di bin 25 Salî yê de, ji bo Perwerdeyên giştî û yên Meslekî, salane 100 Euro bê dayîn.(§ 28 Abs. 3 SGB II). Ev Pere divê ji aliyê Karmenda, ji ber xwe ve li ser Alg II, carekê heta meha Tebaxê 70 Euro û heta Meha Sibatê wekî 30 Euro yî bê dayîn.

Kesên girêdayî Alg II dikarin li cem Navenda Kar û Kesên Alîkarîya Malê û ya Zaroka distînin, dikarin ji bo Zarokê serî li cem Familienkasse bidin. Ev li gorî xwesteka Zagonçêkîra ye bes tenê ku tekilî di xeterîyê de be. Alîkarîya Karê Dibistanê, alîkarîya

karê Malê, di çarçewa "Alîkarî ya Perwerdeyî" de dimeşe. Ev alîkarîyên fêrbûnê ne girêdayî Hatina Aboî ne û dive ji bo wan serî li cem Jugendamt bê dayîn. Zarokên ku di nivîsandin û xwandinê de zehmetîyê dikşînin, di vê çarçewê de tîndestekê kirin. Agahî: Bundesverband Legasthenie und Dyskalkulie e. V., PF 1107, 30175 Hannover.

Kerta Mehane ya Xandevana: Laut § 28 Abs. 4 SGB II 7 divê Navenda Kar yan jî Familienkasse vê mesrefa Xandevana hilgirin ser xwe, " ji bo çûna Dibistana herî nêzîk, girêdayî destekkirina Xandevana ye" Divê dûrbûna Dibistanê ji Male, ji sînorê hatîye nişandan zêdetir be.

### *Alîkarîyên ji bo Komelê Spor û Dibistanên Muzîkê*

"Tevlêbûna Sosyal" ya Zarokên hejar di nav Civakê de bi nîrxê 10 Euro ye (§ 28 Abs. 7 SGB II), dive ji bo wê extra li cem Navenda Kar (Alg-II-Beziehende) li cem Familienkasse serî lê bê dayîn. Daku ji bo " Spor, Lisk, Çand û Civakbûnê yan jî ji bo Zarokên hejar, alîkarîya ji bo Huner yan jî Dibistana Muzîkê bê bicîh kirin" Navenda Kar dixwaze vê alîkarîyê rasterast bide Derfêtdara. (berê xwe bide [OL-Card](#))

Mesrefên wekîdin mînak. Pêlava ji bo Topanê (Fussballschuhe) dikarin ji Sonderfonds "Dabei sein" ji Weqfaeyaleta Malbatê, herî zêde 100 Euro ji bo du Sala bê stendin. Ji bo van alîkarîya dive hûn bi ser rêka Pro Familia yan jî Sozialdienst katholischer Frauen serî lê bidin. (Agahîyê zêdetir ALSO-Extra-Infoblatt „[Bildungs- und Teilhabeleistungen ab 2013](#)"

### *Perwerdekarîya tenê:*

Çi kesê bêyî Hevalê/a xwe bi Zarokê/n xwe dijî û Perwerde û Kulekvana Zarokên xwe yê kêm Temen hilgirtibe ser milê xwe, xwedî mafe Alîkarîya zêde ya ji bo Perwerdekarên Têne, bistîne ( asta bilindbûna Alîkarîyê. Tabelle). Ev Alîkarî ji bo Zarokên kêm Temen yê ku hîn li cem Dê û Bavê xwe dijî derbas dibe.

Ger Zarok bi dorê; geh li cem Dê û geh li cem Bavê xwe dijî, Navenda Kar divê pêwîstîya Zaroka li ser Roja bihesibîne û li gorî wê alîkarîya Dê û Bavê Perwerdekarîya tenê dîkin, bike. Alîkarîya ji bo Perwerdekarên bi tenê, li gorî dema ku Zarok li cem Dê yan jî Bavê xwe derbas dike, tê belavkirin. Ger Zarok li gorî Hefteya û wekî hev Wext li cem Dê û Bavê xwe derbas bike, wê gavê alîkarî di navbera Dê û Bav de wekî hev tê belavkirin. (BSG, Urteil vom 3.3.2009, AZ: B 4 AS 50/07 R).

### *Alîkarîya zêde ji bo Zaroka: (§ 6 BKGG)*

Hesibandina Alîkarîya zêde ji bo Zarok gelekî tevliheve û ji agahîyên berfireh dive Gotarên derheqê Mijarê de bînd xwandin. Li vir tenê nerînekî kurt derheqê wê de:

Alîkarîya ji bo Zarok, Dê û Bavê ku hatina wan ya Aboî tîra wan dike bes tîra xwedîkirina Zarokê wan yê kêmtemen nake, distînin. Ev Dê û Bav dikarin ji bo serê Zarokê herî zêde 140 Euro yî bistîni, alîkarîya ku Zarok ji Alg II distîne û pêwîstîya wî ya ji Alg II ji li ser tê hesibandin. Alîkarîya zêde ji bo Zarok herî zêde ji bo 36 Meha dikare bê stendin. Kesên di Çarçewa vê alîkarîyê de tîndestekê kirin, li gorî pîvanê SGB-II li ber Çav tîndestekê kirin, gera Kar û tevgera ji bo xwe pêşxistinê ji bo Kar ya Alg-II ne di nav van Pîvana de ne.

Serî lêdan ji bo alîkarîya zêde ya Zaroka, bi hawakî nivîskî li cem Familienkasse ya Sazîya Kar, dikare bê kirin. Kesên ku şika wan jê hebe, ku Malbat xwedî mafe ji bo Alg-II, dive serî li Alg-II bidin ji bo ku ji alîkarîyê bêpar nemînin. Alg-II ji roja destpêkê ya Meha ku serîlêdan hatîye kirin, tê hesibandin, serîlêdana ji bo alîkarîya zêde ya ji bo Zarok, dikare duvre jî bê kirin. Ev erk ya SGB-II yanî Navenda Kare, ku Serîlêdana qebûl bikin û Familienkasse û Wohngeldamt jê agahdar bikin.

Gefördert durch:



Niedersächsisches Ministerium  
für Soziales, Gesundheit  
und Gleichstellung

**Regelbedarfe (RB) bei ALG II (§ 20 SGB II)**

ji 01. 01.2015

Kesên	Prozentsatz	Meblax
-------	-------------	--------

**Regelbedarfe (RB) bei ALG II (§ 20 SGB II)**

ji 01. 01.2016

Kesên	Prozentsatz	Meblax
Zarokên ji 0 heta 5 Salan	60 % des RB	237 €
Zarokên ji 6 heta 13 Salan	70 % des RB	270 €
Ciwanên ji 14 heta 17 Salan	80 % des RB*	306 €
Perwerdekirên kêmtemen yên tenê ku li cem Dê û Bavê xwe dijîn	100 % des RB	404 €
Ciwanên ji 18 heta 24 Salan, ku li cem Dê û Bavê xwe dijîn	80 % des RB	324 €
Kesên Tementîje yên zewicî yan ji di Jiyanekî hevaltîyê dijîn	90 % des RB	364 €
Perwerdekirê Tementîje	100 % des RB	404 €

**Mehrbedarf (§ 21 SGB II)**

Ji Hefte ya 13. ya Ducanîtî ye	17 % der RL (404€/ 364€)	68,68 € / 61,88 €
Perwerdekirê:		
• ji her Zarokê bin 18 Salî	12 % des RB	48,48 €
Sînorênbilind:	60 % des RB	242,40 €
Îstîfsna:		
• ji 1 heta 3 Zarokên bin 7 Salî	36 % des RB	145,44 €
• du Zarokên bin 16 Salî	36 % der RB	145,44 €

**Alîkarîyên yekcarî di dema Zayîn û Ducanîtî yê de (§ 23 SGB II) – hesabandina girover li Oldenburg**

Pewîstîyên Zarok (mînak: Dergûş, Doşeka Zarok uhw.)	158 €
Pewîstîyên destpêkê ji bo kincên Ducanîtî yê	77 €
Pewîstîyên destpêkê ji bo kincên Zayînê	154 €

\* Lêkolînerên Rêveberîya Federal hesabandin ku Pêwîstîyên Kesên pewîstîdar ji yên berîya sala 2010 kêmtirê.

**ALSO-Şewirmendî**

sêşem, pençsem û îni

**Demên ji bo Şewirmendîyê di pelên zer yên broşurê ALSO nişankirîne, ji bo hevdîtinê Email ji Navnîşana jêrê re binivsinin:**  
**lk-beratung@also-zentrum.de**